



**Kurdocide Watch - CHAK**

**Organîzasyona mafê mirovan ya li dijî qirkirina gelên Kurdistanê  
Navenda Helebceva Şehîd ya li dijî jenosîdên Kurdan û Enfalê- CHAK**

## **Bi sirgon û şehîdên xwe Kurdên Feylî: "Divê zilma dewleta Iraqê bi dawî were"**

Meha nîsanê dema bîranîna şehîdên Kurdên Feylî ye. Di eslê xwe de, rojên meha nîsanê tev ji bo bîranîna şehîdên Kurdên Feylî giring e. Serê nîsanê destpêka sirgonkirin, bikaranîna Kurdên Feylî ji bo çêkirin û pêşxistina çekên kîmyewî û winda kirina bi hezaran Kurdên Feylî li Iraqê ye .

Berî niha di nîsana 2010 de, li Stockholmê ji bo xwişk û birayên me, Şehîdên Kurdên Feylî roja bîranînê hat pêkanîn. Di roja bîranîna li "Kista Träff"ê hejmarek bilind Kurd, ji gelek aliyên Kurdistanê amade bûbûn.

CHAK, hejmarek dezgeh û nûnerên partiyên siyasî yê Kurd û Erebb dîtinên xwe li ser jenosîd kirin û windakirina bi hezaran Kurdên Feylî anîne zimên. Wê rojê, ji Federayona Demokrat ya Kurdên Feylî / Netverka Jinan, Lana Jafar axaftinek bi wate kir.

Axaftina Lana çend rûpel ji dîroka me, anku ji dîroka xwişk û birayên me yê Feylî ronî dikir. Em wan rûpelên bi kûl, keser û êşe barkirî, di gel xewn û xeyalên wan, bi we re pay dikin.

**Wergêr &Wêne: Gabar Çiyan**

### **Roja bîranîna şehîdan: Kurdên Feylî yê Iraqê û tevkûjiya nijadî**

Em bi xêr hatina we tevan ji dil û can dikin.

Em jibo bîranîna bi hezaran ciwanên Kurdên Feylî ku winda bûn û qet şopa wan nehate dîtin, li vir kom bûne. Em, ji bo bîranîna bi sedan kesên pîr, yê nexweş, seqetmayî, jinên hemîle û zarokên ku bi zorê ji Iraqê hatine sirgonkirin û di rêya ajotina ber bi Îranê de, di mercên pir dijwar de canên xwe ji dest dane, li vir civîya ne. Em wan dayikan bi bîr dihênin ku hesreta wan nasîna goristana zarokên xwe bûn.

Me, berî bi demeke kin qûrbanên li Enfal û Helebceyê bibîr anî. Serokên Kurda, weke misal Serokomarê Iraqê Celal Talebanî bi şêweyekî fermî anî zimên ku, **di rastiya xwe de Enfal, di sala 1980 de, bi sirgonkirin û jiholêrakirina nijadî ya Kurdên Feylî dest pê kiriye û hetanî salên 90 berdewam kiriye.**

Siyasetvanên Kurda dibêjin, **çekên kîmyewî ku li Helebce û deverên din hatine bikaranîn, pêşî bi şêweyê “tecrûbekirina çekan” li dijî Kurdên Feylî yên sirgonkirî hatine bikaranîn.**

Lewma hejmarek bilind ji Kurdên feylî winda bûn û çî caran şopa wan nehatiye dîtin. Li Iraqê bi qasî 300 goristanên tevkujiyê hatin dîtin. Lê goristanên Kurdên Feylî yên windabûyî û cendekên wan qet nehatin dîtin. Çî kes nizane bê çî bi sere 20 hezar Kurdên Feylî hat.

### **Kurdên Feylî kî ne?**

Kurdên Feylî beşek ji Netewa Kurd e ku li Rojhilatanavîn bi cî bûne. Bi dîroka xwe, yek ji wan kevintirîn xelkê li Iraqê ne. Sînore cihê wan, ji rojavayê ava Dicleyê û Kerkûkê dest pê dike hetanî bakurê Basra, Bexdayê û derûdora wê dirêj dibe. Li gorî dîrokzanan, di 1623-29 an de ev dever ji aliyê Kurdên Feylî dihatin îdarekirin. Bi gotinek e din ku mirov bêje, hejmara Kurdên Feylî **“berî sirgonkirina 500 hezar kesan di navbêra salên 1969-1972 û 1980-1990 de”**, çend milyon kes bû.

Hetanî 1980, Kurdên Feylî di industriyê de bazirganên mezin bûn. Di nav wan de siyasetvanên nasdar, teknokrat, helbestvan, muzîsyen, sporvan û hiqûqnas hebûn. Weke mîsal, Sekreterê Partiya PDKI, Rêvebirê Xwendevanê Kurdistanê, Serokê Federasyona Jinên Kurdistanê û ji 4 kesên avakirên YNK ê 2 şexsiyet ji Kurdên Feylî bûn. Dadgêr û hiqûqnasa jin ya pêşî li Rojhilata navîn Zekiya Haqî Kurda Feylî bû. Gitarîstê di nav ereban de nasdar Nesir Shamma jî Kurdê Feylî ye.

Em weke Kurd, û xelkê kevnare yê Iraqê bi vê xebata xwe ya dijwar lê serkevtî, serbilind in.

### **4 nîsanê 1980 roja reş**

Roja 4 nîsana 1980, anku berî bi 30 salan rêvebiriya odeya tîcaretê ya Baxdayê, bazirganên nasdar yê Feylî ji bo pirsar **“pîvana kirîna mal ji derve”** vexwendin civînekî. Kurdên Feylî li wir ji aliyê hêzên ewlekariya dewletê ve hatin girtin û ew li navendên ewlekariya polîsan kom kirin. Dest danîn ser saet, gûstîlk, nasname û tevayê tiştên li ser wan, û ew sirgonî Îranê kirin. Hayê malbata wan û yê çî kesan ji wan tune bû. Bi çî alî ve çûbûn, tu kesî nizanî bû. Sedema girtin û ajotina wan çî bû, kesî nikarîbû bersiva pirsê bide. Lê paşê hate fêmkirin ku, destpêka plana sirgonkirina Kurdên Feylî ji Iraqê bû.

Ew qonax destpêka tevsirgonkirina Kurdên Feylî bû û sirgonkirina wan bê westan hetanî 19 gulana 1990 berdewam kir. Kurdên Feylî bi darê zorê ji mal, dibistan, zanîngeh, cihên kar û meqamên xwe û ji kolanan hatin girtin û berê wan dane navendên ewlakariya polîsan. Dest danîn ser pere, xelek û nixên li ser wan. Li wir hate fêmkirin ku, hevwalîtiya wan ya Iraqê jî destê wan hatiye girtin. Ew bi hev re li timobîlên sergirtî û îzolekirî siwar kirin û berê wan dane sînore Îranê. Li ser sînore ji wan hate xwestin ku, derbasî aliyê Îranê bibin. Tev di bin tehdîdê de bûn. Cezayê nêrîna li aliyê Iraqê bi kûştinê hatibû diyarkirin.

Erdê li ser sînore Iraq û Îranê bi mayînan hatibûn çandin. Kurdên Feylî mecbûr kirin ku bi meşê, peya derbasî aliyê Îranê bibin. Gelek caran bi şev nîvê şevê berê wan didane aliyê Îranê. Kal, nexweş, jinên hemilê û zarok nesibê xwe ji sirgona bêwijdan girtin. Bi rojan meşa wan, bê xwarin û av domiya. Gelek kesên kal, nexweş û zarok di rê de mirin û hejmarek kes bi teqîna mayînan canê xwe ji dest dan. Û namûsa jin û keçên Kurdan, weke hercar kete ber êrîşa neyarên bêwijdan, leşker û polîsên hov.

Zarokên 12-17 salî hatin zîndanîkirin û windakirin. Heta niha tu kes nizane bi çî hate serê wan.

Ji ber zextên giran û rewşa nexweş bi 10 hezaran Kurdên Feylî mecbûr man ku, Îranê bi cî bihêlin û berê xwe bidin welatê xerîbiyê, Ewropa, Emerîka û Awusturalyayê. Bi hezaran Kurdên Feylî li Swêdê bi cî bûn û Swêd bû welatê wan yê duwem.

Paşê, Serokomarê Iraqê Nuri el Maliki di axaftina xwe ji bo Kurdê feylî eşkere kir ku, **hejmare Kurdên Feylî yê wînda zêdeyî 20 hezar kesan e.**

### **Biryara 666 ya rejîma Iraqê**

Konseya Şoreşa Iraqê (Revolution Command Council) di 7 gulana 1980 de biryarek girt. Biryara 666, benda hemwelatîbûna Iraqê ji nû ve formule dikir. Li gorî biryarê kesên ne ereb, ku bi xaka welatî re ne rast in, li dijî pêşketina welatî ji awira neteweperestî û civakî xebatê dikin, dê hemwelatîbûna wan bi dawî were û bêne sirgonkirin, ji welat bêne derxistin. Biryar ji aliyê **“dîktatorê Iraqê Saddam Hisêyn ve hatibû îmzekirin û di rojnameya fermî El-Waqae al-Iraqie, hejmara 2776, 1980-05-26”** de hatibû belavkirin.

Di eslê xwe de, tevayê qanûn û biryaran piştî ku di rojnameyê de belav dibin, têne bikaranîn. Lê pir ecêb e ku, berî ku qanûn di rojnameyê de belav bû bi 2 mehan, girtin û talan dest pê kiribû. Rejîma Saddam û partiya Baas mafê hemwelatîyê ji Kurdên Feylî girtibûn, belgeya nasnameyên wan bê nîrx kiribûn, dest danîbûn ser mal, milk û pereyên wan.

**Ev tevcezekirin, ji holê rakirina nijadî û tevkûjîya li dijî Kurdên Feylî pêk hat sucek mezin e û li dijî însanetiye ye. Her wisa li dijî peymanên Yekîtiya Miletan-UN ê ye û mafê mirovan yê bingehîn binpê dike.**

Di ser têkçûna rejîma Saddam Hisêynî re 7 sal derbas bû. Piştî çûna wî, rêvebirên hikumeta Iraqê yê sereke ji bo paşdedayîna mafê Kurdên Feylî gelek tiştên erênî gotin û soz dan. Weke;

- Zaniyariya li ser 20 hezar kesên wînda

- Paşdedayîna hemwelatîya Iraqê, nasname û malê û milkên hatibû talankirin.

Lê hetanî niha çî tiştê nehatiye kirin. Rêvebirên dewletê pirsê çareser nakin û ji bo pirsgerêkên ji me re girîng, giran tevdigerin. Tenê di dema hilbijartinan de soz û peymanê didine me. Lê piştî hilbijartin bi dawî tê, derdikeve holê ku tiştên hatine gotin, ji rastiyê dûr in. Hilbijartina dawiyê eşkere kir ku, pirs nehatine çareser kirin. Di dema hilbijartinê de hemwelatîya me ya Iraqê bû cihê pirsê. Bi hezaran Kurdên Feylî nikarîbûn dengê xwe bikar bihênin û bi sedan rayên me ji aliyê daîreya hilbijartinê, weke deng nehatin pejirandin.

7 sal in em rawestiyan da ku şaşîtiya hatiye kirin bê rastkirin, û mafê me yê bingehîn bi paş de bê dayîn. Anku hemwelatîya me ya Iraqê, nasname, mal û milkên me, paş de li me vegeerînin û zaniyariyê li ser kesên wînda bidine me.

Divê çiqasî din em li benda bidestxistina mafê xwe rawestin û îşkencê bikşînin? Hikumeta Herêma Kurdistanê ji bo bidestxistina mafê me çî dîke? Hêzên li raqê ji bo dermankirina vê birînê çî dikin? Partiyên polîtîk yê Swêdê çawa dikarin ji bo çareser kirina pirsê bibin alîkar? Anjî em in ew Kurdên ji ber destê rejîma xwînrej hatine ajotin û jibîrkirin dê qet alîkariya me neyê kirin?

Em hêvîdarin ku, bersivên rast bê dayîn ku bersiva pirsên bêbersiv bide. Pêwîstiya me bi piştgiriya heye û spas ji bo piştgiriya we.

Federasyona Demokrat ya Kurdên Feylî / Netverka Jinan

**Navenda Dokumentasyonê ya CHAK ê & kurdocidewatch.net**



**Beşek ji wêneyên şehîdên Kurdên Feylî**



**Lana Jafar daxwaziyên Kurdên Feylî anî zimên**



**Beşdarên roja bîranîna şehîdên Kurdên Feylî li Stockholmê, nîsan 2010**



**Ji CHAK ê Hawre Hirani axaftinek kir**



**Ji Federasyona Kurdên Feylî Majeed Jafar diaxîfe**